

---

HILLA PELED-SHAPIRA

WERGERA JI ÎNGILÎZÎ: ÖMER DELİKAYA

---

## GELO HELEBÇE XALA WERÇERXÊ BÛ JI BO HELBESTVAN BULEND EL-HEYDERÎ?

---

Di gotara xwe ya li ser pêkhatina nasnameya netewî de Smith (1995: 129-153) aşkera dike ku benîadem xwedî gellek nasnameya ye û bi hevdemî dikare xwe bi van hemû nasnameyan ve bibestîne. Di nava van nasnameyan de, statûya koma etnîk a ku aîdiyeta takekes pê re heye, nasnameya serdest e. Çavdêriyên Smith ne tê de, di salên 1940 û 1950an de ronakbîrên ciwan ên li Bexdayê zêde bala xwe nedidane ser mîrata xwe ya qewmî, dînî û hizbî. Berevajî vê, berî ku bibin perçeyek ji etnîsîteyêke din, bi taybetî jî “kurdên erebbûyî” yên ku “ji mêj ve tev li muhîta erebî bûne”, wan dida xuyakirin ku ew perçeyekî ewil-serekî yê Iraqê ne (Bashkin, 2009: 183, 185). Bi rastî, Natali (2005: 44-46) amaje pê dike ku di nivê sedsala bîstemîn de kurdên li Iraqê ji ber gellek sedeman, zêdetir jî ji ber ên polîtîk “berê nêzîkî Iraqîbûyînê bûn, di Iraqêke demokratîk de, netewperweriya kurdî dupat dikirin”. Lêbelê, wê demê şîa, sunnî, cihû an jî kurd di derdora civakî û çandî de cihekî çalak digirtin (Bashkin, 2009).

Di vê nivîsarê de, ez nîqaş dikim ku di Komkujiya Helebçeyê ya di sala 1988an de, wexta ku ji aliyê hêzên hewayî yên Iraqê ve gaza sarînê li ser kurdan hate rijandin û di encamê de bi hezaran mêr, jin û zarokên kurd bi awayekî hovane qirr dibin, helbestvanê Iraqî-kurd Bulend el-Heyderî dikeve ferqa nasnameya xwe, lê bi awayekî wisa ku bi temamî nasnameya xwe ya erebî û hezkirina xwe ya ligel çanda erebî û Bexdayê

---

*Çavkanî: Peled-Shapira, Hilla, Was Halabja a turning point for the poet Buland al-Haydari? Kurdish Studies, Volume: 2, No: 1, pp. 14 – 33, May 2014*

naguerîne. Bi riya nirxandina xwe, ez ê nîşan bidim ku hetanî Komkujiya Helebçeyê, Bulend el-Heyderî xwe spartiyê nasnameyeke aloz û melez, lêbelê, ji qetlîama Helebçeyê û vê de, salixdana wî ya komkuji û Kurdistanê wekî êşeke giran li kêlekekê, wî hê jî berî nasnameyên din xwe wekî ereb û iraqiyekî dihesiband.

### Paşxaneya Çandî û Siyasî

Bexdaya salên 1940 û 1950an ji aliyê huner û edebiyatê ve şên bû, hunermend, peykersaz, helbestvan, romannûs, nîgarkêş û hwd., tê de dicivîyan û nîqaşên gurr li ser babetên siyasî û hunerî dihatine kirin (Bashkin, 2009). Yek ji wan komên edebî yên wê heyamê *Ceme'at el-weqt el-daî* (Civaka Demên Winda) bû ku tê de ji her dîn û qewmê endamên çalak hebûn. Endamên vê komê têdikoşiyar ku di bin karîgeriya tevger û trendên Rojavayî de çand û hunera Iraqê geş bikin (al-Musawi, 1985:334-335; Shulayba, 1996: 61; Caiani û Cobham, 2013: 38-41). Bulend el-Heyderî endamekî sereke yê vê civakê bû û perçeyekî hindirîn ê hilberîna edebî bû di peytexta Iraqê ya salên 1940an de (Baram, 1991: 87).

Heyderî ji malbateke esilzade bû, lêbelê wî xwe bi xwe perwerde kiribû. Di sala 1958an de piştî Iraq ji monarşiyê ber bi komarê ve veguherî, Heyderî hêvî dikir ku hikûmeteke dilpaktir were. Dîsa jî, digel atmosfera afirîner, li Bexdayê hunermendên çepgir û komunîst ji ber destê karbidestên Iraqî tadeyên mezin dîtin. Hunermend, rojnameger, ronakbîrên ku xwe dispartine fikrên çepgir, ji kar dihatin avêtin, dihatine desteserkirin, diketine hepsê, şkence didîtin û dihatine kuştin û sirgûnkirin (al-Azzawi, 1997:271-272; Al-Sa'idi, 1996; Al-Hajj, 1993: 103, 121-122; Fattal, 2003: 304, 309-317). Cihên ku ew berê tê de dicivîyan, dihatin girtin (Jabra, 1994: 175) kesên ku edîtorên rojnameyan bûn dihatin hepiskirin (Fawzi, 1985: 47-78). El-Heyderî jî bûye mexdurê tadeyên wiha. Ji ber vê yekê, navbera salên 1963 û 1976ê de mala xwe bar dîke û diçe Bêrûdê, di sala 1980yî de vedigere Iraqê (Ajami, 1998: 3-7; Basri, 1992: 91; Jabra, 1994: 123-124; Campbell, 1996:519-520; Moreh, 1976: 271; Boullata, 2010: 278).

Wekî romannûsên din ên Iraqî-kurd ên ku di dewsa kurdî de bi erebî dinivîsin da ku xwe bigihînin girseyeke mezintir (Zeidel, 2001: 29), el-Heyderî jî ne tenê helbestên xwe herwiha kitêbên xwe yên li ser ziman û çandê, nivîsarên xwe yên li ser hunerê û neh berhevokên helbestê giş bi zimanê erebî nivîsine.<sup>1</sup> Tercîha wî ya zimên û babetê, di rastiya xwe

1 Ev listeya ku tê ji weşanên el-Heyderî pêk tê: Berhevokên helbestan: *Khafqat al-tin*

de dikare wekî delîlek bête hilgirtin, çimkî el-Heyderî berî hemû nasnamayên din xwe wekî Iraqiyekî qebûl dike.

Di sala 1988an de, di dawiya şerê Iraq û Îranê de, artêşa Iraqê di dema operasyona Enfalê de êrişekê dibe ser bajarê sînorî Helebçeyê ku firokeyên Iraqî bi dehan kanîsterên gaza bijehr ji jor de rijandin û nêzîkî 5000 mêr, jin û zarok bi hovane hatin qetilkirin. Bi temamî, wekî encama operasyona Enfalê ya ku di navbera sibat û îlona 1988an de berdewam bû, zêdetirî sed hezar kurd revîyan çûn Tîrkiye û Îrana cîran. Rejîma Iraqê di mehên li pey de xebitandina çekên kîmyewî di herêmên din de jî berdewam kir, lêbelê, komkujiya *Helebçeyê* bû sembola jenosîdê ya ku ji aliyê desthilatdarên Iraqî ve li hember nifûsa kurdan hatibû kirin. Helebçe, bi awayekî baş hatiye zanîn û belgekirin, çimkî rojnamegerên ku ji aliyê Îranê ve derbasbûna wan hatibû hêskirin, video û wêneyên Helebçeyê girtin û herwiha wexta hê şerê gurr berdewam bû wêneyên mexdûran bi berdewamî li ser televîzyonên Îranî dihatin weşandin.

Pirraniya kesên ku li jiyane mabûn, piştî demekê ji ber birînên xwe, jiyana xwe ji dest dan û yên mayîn ji aliyê Iraqê ve an hatin guhastin an jî înfazkirin. Bi sedan gundên kurdan bi awayekî sistematîk hatin hilweşandin û bi darê zorê hatin valakirin da ku pêşmergeyên kurdan nikaribin alîkariyê hildin (Hiltermann, 2007; Bengio, 1989: 193-197, 1996: 228-229, 1999: 153, 2012: 177-183; Tripp, 2000: 244-245; Farouk-Sluglett and Sluglett, 2001: 268-270; Shohat, 1989: 10; Baram, 1991: 22; Aziz, 2011: 78-79; Hardi, 2011: 13 - 37).

---

(*Rehjena Herî*, Bexda, 1946), *Aghani al-madina al-mayyita (Kilamên Bajarê Mirî*, Bexda, 1951), *Aghani al-madina al-mayyita wa-qasa'id ukhra (Kilamên Bajarê Mirî û Helbestên Din*, Bexda, 1957), *Khutu-wat fi al-ghurba (Gavên li Sirgûnê*, Sîdon, 1965), *Rihlat al-huruf al-sufî (Gera Nameyên Zer*, Bêrûd, 1968), *Aghani al-ħaris al-mut'ab (Kilamên Nobedarê Westiyayî*, Bêrûd, 1971), *Hiwar 'abra al-ab'ad al-thalatha (Diyalogên bi Sê Rehendan re*, Bexda, 1972), *Ila Bayrut ma'a taħiyati (Silav ji Bêrûdê re, Qahîre, 1984, London 1989), Abwab ila al-bayt al-dayyiq (Deriyên Mala Teng*, London, 1990), *al-A'mal al-kamila (Hemû Berhem*, Kuweyt û Qahîre, 1992). Gotar û kitabên li ser edebiyat û hunerê: *Isharat 'ala al-ħariq wa-niqb aħ daw' (Rênişanên li ser Rê û Îşaretên Ronahiyê*, Bêrûd, 1980), *Zaman li-kull al-azmina: nazarat wa-ara'fi al-fann (Demek ji bo Hemû Deman: Fîkr û Nêrinên li ser Hunerê*, Bêrûd, 1981), *Madakhil ila al-shi'r al-'iraqi al-hadith (Destpêka Helbesta Modern ya Iraqê*, Qahîre, 1987). Jêgirtinên ji helbestên el-Heyderî yên di vê nivîsarê de ji *Hemû Berhemên (al-A'mal al-kamila)* wî hatiye, Kuweyt û Qahîre, 1992. Dîroka weşanan dibe ku xelet bin, çimkî ev, berhevoka dawî ya el-Heyderî ya ji sala 1993an di nêv xwe de dihewîne. *Hemû Berhem* divê herî kêr berî 1993an nehatibe weşandin û ez ê jêgirtinan ji vê werbigrim di vê gotarê de.

## Hevdemên el-Heyderî yên kurd

Berî ku em li nasnameya kompleks a el-Heyderî vegerin, divê em amaje pê bikin ku helbestvanên din ên Iraqî-kurd yên dewra wî ji bo derbirîn û dupatkirina nasnameya xwe ya kurdî tu carî nediketin dudilîyê û ji ber vê jî em ê piştî *Helebçeyê* di tevgerên wan de tu guhertineke mezin ji wan hêvî nekin. Eger em lê binêrin, sermeselê, helbestvanê naskirî Şêrko Bêkes (1940 - 2013), yê ku jê re başûrê Iraqê qedexê bû û paşê li Îran û Swêdê jiya, di axiriyê de, di sala 1992yan de vegeriya Kurdistanê û bû wezîrê çandê di Hikûmeta Herêma Kurdistanê de (HHK), em dibînin ku wî helbestên xwe ji bo evîndariya Kurdistanê û hejmetkariya ligel zarokên kurd nivîsiye yên ku di temenên xwe yên biçûk de bi hilgirtina çekan ve mezin dibin. Ew helbest di 1979 û 1985an de hatibûn nivîsîn û tu eleqeya wan bi *Helebçeyê* re tune bûn (Weissbort Simawe, 2003: 62, 267-268). Nîrxandineke li ser helbestên Ehmed Herdî (1922-2006) yê ku ji el-Heyderî û Bêkes hez dikir û mecbûrê sirgûnê bibû, aşkera dike ku seba kurdan hezkirineke wî ya zaf berçav heye, wekî “*Azadîhezên Xwedê*” (Weissbort and Simawe, 2003: 90, 268); ya rastî, wexta ku dinivîsî, wî bi aşkeratî xwe wekî kurd pênase dikir: “Em Kurd”. Mirov dişê helwesteke bi heman rengî di helbestên Ebdulla Peşêw de jî bibîne (1946-) digel ku bi şêwazeke zêdetir milîtan e (Weissbort and Simawe, 2003: 192-193, 272).<sup>2</sup>

## Berî Komkujiya Helebçeyê Helbesta el-Heyderî

Berevajî helbestvanên ku nasnameya wan a kurdî di helbestên wan de zaf serdest e, Heyderî berî *Helebçeyê* zêde balê nakişîne ser binemala xwe ya kurdî. Ew xwedanê nasnameyeke kompleks û melez bû: Ew ronakbîrekî komunîst ê Iraqî bû ku di malbateke dewlemend a kurd de ji dayîk bibû, lê dixwest bi feqîran re jî di nav têkiliyê de be; helbestvan û ronakbîr bû; misilmanekî bi ihtimal xwedan fikrên laîk bû, ji ber jiyana xwe ya bohem lome lê dihat kirin, niştecihekî Bexda, Bêrûd û paşê jî yê Londonê bû; zindanî û sirgûniyek bû. Ev pêkhatayên navborî hemû perçeyên jiyana wî helbesta wî bûn, lêbelê nasnameya kurdî ji hêla wî ve “terkkirî” bû û piştî *Helebçeyê* ji bo demekê “ji nû ve rû dabû”. Armanca me ew e ku em lê bikolin bê ka nasnameya wî ya kurdî ya ji nû ve rûdayî xwe-diyê girîngiyekî ye an tenê derbirîna hestên derheqê komkujiyê de ye.

2 Helbestên navborî yên bi kurdî ku ez behsa wan dikim di eslê xwe de ji aliyê Muhamad Tawfiq Ali ve ji bo îngilîzî hatine wergerandin seba pirtûka Weissbort û Simawe (2003).

Bi salan el-Heyderî kartêkirinên ji çavkaniyên cuda di helbesta xwe de civandin, metaforên bêminak ji dinyaya heywanan wergirtin û derbirinên demê yên ku ji cîhana fîzîkî diborîn digel metaforên navborî ji bo têkiliya di navbera welatê xwe û desthilatdaran de xebitandin (Pelled-Shapira, 2012, 2013). Rast an jî xeyalî, pîrraniya helbestên wî evîna jinekî vedibêje, hinek jî derheqê dayîk an jî kurekî vebêjerê helbestê de ne. Hin helbestên wî pêwendiya ronakbîrên mixalefet a bi rejîma Iraqê re, zîndankirin û şkenceyên wî salix dide û hinekên din jî derbarê sirgûn û tengasiyên wî de ne. Bi gotineke din, el-Heyderî “ji ewr an jî ji hestên ku li ser ezmanên rengareng werba dibin zêdetir bala xwe dida kûrahî û kendalên tarî” (Huri, 2006: 82).

### **Di helbesta el-Heyderî de mîrata misilmaniyê**

El-Heyderî di helbestên xwe de ji bo ku zehmetiyên têvel ên ronakbîrî û yên jiyana xwe ya taybet bide xuyakirin, termînolojî û karakterên edetî yên misilmantiyê dixebitîne. Hin caran, ferqa di navbera takekesî û hevpariyê de şêlî dibe. Wek mînak di helbesteke bi rengê îslamî de “De ka ez vegerim...li kê...?” (*A’a’udu... li-man...?*) (Al-Haydari, 1993: 793-797). Di vê helbestê de helbestvan hukimranê Etiyopî yê xirîstiyar *Ebrehe* tîne bîra xwîneran, yê ku li gorî kevneşopiyên misilmaniyê bi awayekî neserkeftî hewl daye ku li Mekkeyê Ke’beyê hilweşîne. Vebêjerê helbestê jê dipirse:

*Te ji gelê xwe re çi hişt?*

*Ey Ebreheyê poz pirtikî*

*Lê sîberên korbûyî*

*Teseliya goşeyên devera xalî dikin*

*Û şevên tarî yên derizî*

*Di navbera herî û xwîne de (r. 793)*

Karakterê Ebreheyê yê di helbestên el-Heyderî de xwedî cot-wateyê ye, çimkî li milekî rayedarê Iraqê yê ku her tiştî dirûxîne temsîl dike, lêbelê di rêzikên dawî yên helbestê de vebêjerê helbestê ji Ebrehe daxwaz dike ku were hindirê wî, bi vî awayî vebêjerê dîsa bikaribe bijî, wekî bîranîneke bedbîn a ku divê bimire da ku bîranîneke baştir vejîne. Ev kaviil kaviilê merivan bû û berevajî Ebreheyê neserkeftî yê ku hewl dida Ke’beyê hilweşîne, ew rastî bû. Ya ku el-Heyderî xwestiye di vir de bike, teknîkeke bi navê *sekulerkirina muqedesan* e (*secularisation of the*

holy), ku wê demê di nava nivîskarên komunîst ên li Rojhilata Navîn de berbelav bû: Ke'beya Pîroz dewsa ku bibe cihekî şênber ê rast, "takekesiya sekuler" a neteweyekî werdigire.

Mînakeke din ji *sekulerkirina muqedesan* a di helbestên el-Heyderî de mihraba di mizgeftê de ye ku eşyayekî duayên takekesî yên ji dil e, wateyeke nû lê bar bûye di helbesteke bi navê "Xwezaya Dirinde" de (*al-Tabî'a al-ghadiba* el-Heyderî, 1993: 83-86. Yekem car di 1946 de hatiye weşandin):

*Û mîna ku li pişt şevê be*

*Dilek heye bêzar bûye ji êş û azarên berdewam*

*Bêdengî kerixî ye ji qerebalixiya rihên di mihraba wî de. (r. 83)*

Mîna *Mihrab*, *Cennet* ango bihuşt ji ji aliyê el-Heyderî ve bi awayekî bêhempa hatiye bikaranîn wexta ku ew rewşa li bajaran salix dide, ew di helbesta xwe ya bi navê "Şeş Niqte û Bêdengî" de (*Sitt niqat wa-samt'*. El-Heyderî, 1993: 729-731, yekem car di 1990î de weşiyaye) dizane:

*Şeva ku dergehên bihuştê heta piştê*

*Vekirîne*

*Lê bihuşt belam laşê mirovekî kuştî*

*Û ez*

*Birînên wî bûm. (rn: 729-730)*

Di vê helbestê de el-Heyderî welatê xwe Iraqê berawirdî ligel nexşe-yeke ji derew û xeyalekê pêkhatî kiriye (*Watani ya kharita min kadhab [...] min hulm. [r. 730]*) ku ji gelê xwe re ji jan û mirinê pê ve tu tiştî nayne. Objeya hêviyê ya bawermendên misilman ku pê digihin bihuştê, li vir dibe kabûseke sirgûnê.

Wekî *Mihrab* û *Cenetê* îlahên pêş-îslamî *Lat* jî di helbesteke wî de xuya dike, "Cejn" (*al-Walîma*. Al-Haydari, 1993: 609-610, yekem car di 1989 de hatiye weşandin), wekî beşeke şayesandinên welatekî ku niştecihên xwe bi saxî dixwe:

*Û wexta ku rojnameyên sibehê ji me re dibêjin*

*Anîne Lat li çarmixê xistine û laşê wî*

*Aniha li peristgeha bajêr dardakirî ye*

*[...] Lat çi mezin e, dema dimire*

*Ji gelekî xemgîn re dibe şahî (rn. 609-610)*

Wekî sembola nankoriyê *Lat*, di vir de wateya îlahê ku di heman demê de xwarina niştecihên welêt e, werdigre li ser xwe. Digel ku di dîroka beriya îslamiyetê de wekî jinekê dihate qebûlkirin, li gorî vê helbestê *Lat* îlahêkî mêr e, ev guherîn îxlalkirina adetê pêk tîne.

Di helbesta navborî ya bi navê “De ka ez vegerim...li kê...?” de jî mirov dikare dîrokeke îslamî bibîne: *Sala Fîlê* (*‘Am al-Fil*. Qur’an, beşa 105an) ew sala ku pêxemberê îslamê Hz. Mihemed tê de ji dayîk bûye, heman sal e ku Ebrehe xwestiye Ke’beyê hilweşîne, derdora 570 PZ. Lêbelê ew helbesta ku tê de bi şayesandinên xwînê, windakirin û merivên mirî ve qala dîrokê tê kirin, nîşan dide ku bi salan e tiştê neguheriye û heyfa xwîna merivan hê jî nehatiye hilanîn.

Fîgûrekî din ji dîroka îslamê yê ku el-Heyderî di helbestên xwe de behsa wî dike waliyê Emewiyan ê Iraqê *el-Heccac b. Yusuf el-Teqefî* (661-714) ye ku bi rêveberiya xwe ya zordar û bi xeberdanekê xwe ve navdar e, ew di wê xeberdana xwe de pêşbînî dike ku xwîn wê ji laşê mirovên serjêkirî biherike. Di helbesta xwe ya “Vegera Qurbanî” de (*‘Awdat al-Dhahiyya*. Al-Haydari, 1993: 761-764) el-Heyderî li ser pevçûna dîrokî ya walî û dijberê wî Se’îd b. Cubeyr -zanyarekî ji Kufeyê ye- de diyalogekê çêdike ku tê de vebêjerê helbestê salixa welatekî dide ku take-dengê ku li wir tê bihîstin dengvedana dengê rêveber e, yê ku bi navê şeytên diqîre:

*Xêncî siya min tu tişt tune... Ez ê piştî xwe tu tiştî nehêlim*

*Xêncî siya xwe*

*Û biriqîna şurê kişandî*

*Û xwîna ku heyfa wê nestandî* (r. 761)

Vebêjerê helbestê, di heman demê de ji el-Heccac re dibêje ku demeke wisa wê were ku tê de qatilê bibe meqtûl (herwiha bibîne: al-Musawi, 2006: xvi). Bi vî awayî vebêjer ji bo ku zordestiya rejîma Iraqê ya modern -çî li hember kurdan çî jî li hember gelê Iraqê bi gîştî- rexne bike ji dîroka îslamê fîgûrên ku ji ber zilma xwe hatine şermazarkirin dixebitîne. El-Heccac herwiha di helbesta bi navê “Sînorên ku Hatine Dizîn” de xuya dike (*al-Hudud al-Masruqa*. al-Haydari, 1993: 693-697, yekem car di sala 1990î de hate weşandin), di pêwenda “welatê îdamkeran” (*Watan al-jalladin* [p. 693]) de ku li wî welatî de ronakbîr bêqîmet tên dîtin û li seranserê bajaran guhên wan tên kişandin.

Herwisa yekem xelîfeyê Ebasiyan el-Sefah, ê ku wateya navê wî “xwînmij” (Moscati) e, di helbesta bi navê “Mirina di Çar Dengan de”

(*Al-mawt ma bayna al-aswat al-arba'a*. Al-Haydari, 1993: 819-824)  
de ligel el-Heccac dixuye:

*Dema ku paceya xwe vedikim [...]*

*Dengê taciran dibihîzim ez*

*Radigihînin*

*Dîrokekî ji bo firotin û serokan*

*Yên ku rûyên wan mîna sola biriqî, diçilvîlin*

*Kuştiyên kujeran daxwaza goristanekî dikin*

*Û zindanî*

*Û tawanbarî*

*Bi awayekî nerihet di nav xeberdanên el-Heccac û şûrê el-Sefah de*  
(r. 820)

Ji bo xatirê wan kesên ku desthilatdarên Iraqê zilm lê kiriye, zor-darî û pozbilindiya El-Heccac û el-Sefah wekî alegoriyek tên bikaranîn. Wekî ku me li jor jî destnîşan kir, el-Heyderî bi mebesta rexnekirina desthilatdarên Iraqî, bi terza xwe ya resen ve termînolojî û karakterên îslamî yê dîrokî diemilîne. Herçiqas el-Heyderî qunciknûs be jî, em dikarin ji bikaranîna zêde ya insûrên ji dîroka îslamê ya di helbestên wî de pê derxin ku ew di zaroktiya xwe de bi vî rengî hatiye perwerde-kerin û ev beşa nasnameya wî jî gellek serdest e. Me li ser rewşên li jor salixdayî çavdêrî kir ku qesta wî hemû Iraq e, bi taybetî ne tenê kurd in.

### **Sembolîzma mesîhiyê di helbesta el-Heyderî de**

Sembolên mesîhiyê ji aliyê helbestvanên ereb ên sosyalîst û komunist ve bi berdewamî têne bikaranîn, ji ber ku simbolên wiha “fikra mesîhî ya xelasbûnê ya bi riya êşkêşiyê pêk tê û ew baweriya ku bi vejîna Hezretî Îsa ve ji heqê mirinê dertê, pêşniyaz dike.” (Moreh, 1976: 270-271). Sembol ji lawijên mesîhiyê hatine wergirtin û di nava helbestvanên ciwan ên ereb ên nîveka sedsala bîstemîn de li kar in, ne ku ji bo serpêhatiyeke dînî, lêbelê ji bo rewşa hişî û fizîkî ya ronakbîrên tepeserkirî nîşan bidin, tên bikaranîn. (Moreh, 1976: 247).

Di helbestên el-Heyderî de, ev îdia di têgiha *palmiyeya mixkirî* de ku vegera mirinê dinimîne, ji xwe re palpiştîyê dibîne, sermeselê di helbesta “Tawanbar jî Bêguneh e” de (*Muttaham wa-law kuntu bari'an*. al-Haydari, 1993: 541-544, yekem car di sala 1973an de weşiya-ye [r.544]), di heman helbestê de, hesta belengaziye, “Li dîwêr xaçkirî



mam” (*baqitu masluban lada al-jidar* [r. 541])<sup>3</sup>. Helbesta ku me berê behs kiribû ya bi navê “Cejn”ê de el-Heyderî di heman demê de îlaha berî-Îslamê *Lat* û *Xaçê* û laşê îlaha ku li peristgeha bajêr dardakirî ye bi hev re tîne zimên.

*Anîne Lat li çarmixê xistine û laşê wê  
Aniha li peristgeha bajêr dardakirî ye (r.609)*

El-Heyderî bi vî rengî di navbera xwîna vebêjerê helbestê yê ku di dawiyê de xuya dike û laş û xwîna Îsayî de hevberkirineke çaverêkirî dike. Herwiha, di helbestên el-Heyderî de hema wisa *birîn* xuya dikin, ev birîn wekî birînên çarmixkirina Îsayî derd, êş û janê dinimînin, wekî mînak di helbesta wî ya “Bendewarî” de (*Intizar*. Al-Haydari, 1993: 87-89, yekem car di sala 1946an de): “Berbang wê dîsa hîlbê li ser birîna nekewîyayî” (*wa-l-fajr yulad marra ukhra ala nazf al-jirah* [r. 89]).<sup>4</sup>

Çarmixkirin herwiha di helbesta “Dilsariya Mirovê Qedîm” (*Khaybat al-insan al-qadim*. Al-Haydari, 1993: 389-391, yekem car di sala 1968an de weşiyaye) de jî derbas dibe ku tê de em pêrgî şayesandinan tîne û em dibînin ku jiyan û zeman ji kesê sirgûn re wisa xerab lê hatiye ku wê rewşa xwe ya xerab bi çarmixkirinê re miqayese dike:

*Jiyan  
Mîna ku eniya mirov li xaçê ve bê mixkirin  
Mîna ku Mesîh her saetê bê çarmixkirin  
Mîna ku ev mirovê mirî her kêliyê bê xaçkirin. (r. 390)*

Di helbesta bi navê “Kê Dizane, Bexda” de (*Man yadri ya Baghdad*. Al-Haydari, 1993: 535-539, yekem car di sala 1973an de weşiyaye),

3 Xaçeke darîn bi mirinên di şerê sîvil de yên li Bêrûdê re hatiye têkildarkirin, di helbesta bi navê “Lêbexşîna Te... Bêrûd” (*Ghufranaki...Beirut*. Al-Haydari, 1993: 617-619, yekem car di 1989an de).

4 Herwiha helbestan bibîne; “Mirina Helbestvanekî” (*Mawt sha'ir*. Al-Haydari, 1993: 101-104, yekem car di 1946an de), “Ew Tiştê Biçûk” (*Dhalika al-shay' al-saghir*. Al-Haydari, 1993: 153-154, yekem car di 1946an de), “Mirina di Çar Dengan de” (*Al-mawt ma bayna al-aswat al-arba'a*. Al-Haydari, 1993: 819-824); “Di Dema Bêguhiya Tawanbar” (*Fi zaman al-bara'a al-muttahama*. Al-Haydari, 1993: 443-448, yekem car di 1968an de); “Li Ser Riya Koçberiya ji Bexdayê” (*Fi tariq al-hijra min Baghdad*. Al-Haydari, 1993: 671-674, yekem car di 1990î de); “Dema ku Ew ji Me Dûr Ket” (*Thumma rahala 'anna*. Al-Haydari, 1993: 647-653, yekem car di 1989an de).

helbestvan ango ronakbîrê komunîst ê derbider bi çavê xaçkiriyeke ve paytexta Iraqê wekî xemgîniyê salix dide. Di helbesta navborî “Dilsariya Mirovê Qedîm” de koçberiya wî ewqas lê zor tê ku wekî sirgûniyekî dihizire ku ew jî wekî Xwedê li sirgûnê dimire:

*Wa li vir ez dimirim xwîşka min*

*Wekî Xwedayê ku li sirgûnê dimire (r. 390-391)*

Bikaranîneke din a simbolîzmên mesîhiyê, di helbesta bi sernavê “Îxaneta Yehuda” (*Tawbat Yahudha*. Al-Haydari, 1993: 309-312, yekem car di sala 1965an de weşiyaye) de mebest helbet Yehuda Îskarîot e ku bi îxaneta li Îsa tê tawanbarkirin; di vê helbestê de helbestvan poşman dibe ku bi têra xwe ji gelê xwe re nebûye alîkar û ji ber ku ji destê wî nehatiye wan xelas bike, li xwe eziyet dike. Ronakbîr bi gelemperî wekî pêşengên civakê têne hesibandin ku civakê derbarê nexweşiyên civakî de hişyar dikin. Lêbelê ronakbîrên muxalif ên di cimaeta ereban de bi gelemperî xwe di nava dudiliyekî de dibînin, çimkî li milekî gel her tim ne di wê şiyânê de ye ku bi awayekî rewşenbîrane fikrên wan ên Rojavayî fam bikin, li milekî din jî desthilat ji ber fikrên wan ên çepgir wan tepeser dikin. Li vir el-Heyderî poşmaniya Yehuda wekî poşmaniya xwe pêşkêş dike:

*Ez li hemberî te bûm gelê min*

*Ez dizanim*

*Çawa ku min hûn der kirin*

*Û min hûn destevala hiştin*

*Li ser de jî birçî*

*Û rûxandin [...]*

*[Hetta] îdam jî wê gunehên min paqij neke (r. 311)*

Berevajî helbestên ku ji aliyê hevdemên el-Heyderî ve hatine nivîsîn, yên ku tê de Yehuda Îskarîot wekî sembola zaliman tê behskirin (Moreh, 1976: 249-250), li vir el-Heyderî xwe wekî Yehuda dihesibîne, çimkî di xelaskirina gelê xwe de têk çûye.

El-Heyderî van simbolên mesîhiyê bi termînolojiya îslamiyê ve bi kar tîne da ku balê bikişîne li ser hesta êşkêşiyê û takekesiya xwe ya dilazar. Herçiqas el-Heyderî misilman e jî ji bo derbirîna serpêhatiya xwe ya wekî ronakbîrekî tepeser kirî hêmanên mesîhiyê bi kar tîne. Ev hêmanên navborî nasnameya wî ya kompleks ronî dikin, ev jî ji mîra-

ta wî ya misilmaniyê û ber de jî mesîhiyê tê. Ev yeka nayê wê wateyê ku aliyekî nasnameya el-Heyderî mesîhî ye, lêbelê mîna nivîskarên din ên dewra xwe, ew jî boneta derbirînên xwe ligel amûrên din, hêmanên mesîhiyê jî dixebitîne. El-Heyderî îslamiyet û mesîhiyê digihîne hev-du dema ku di helbesta bi navê “Kê Dizane, Bexda” de, wekî nefretkirî (*awghad*) û fêlbaz (*dajjalun*) behsa helbestvanan dike. Peyva erebî ya *Deccal* tê wateya Tecal û di helbestê de mebest jê berî ku bibe xwediye helbestvanê xwe yê taybet Hesên b.Tabî, helwesta neyînî ya li hember helbestvanan a Mihemed Pêxember e, wekî ku di sureya Şuara ya di Qur’anê de jî derbas dibe (suret 26, ayet 224-226).

### Mîtolojiya yewnanî di helbesta el-Heyderî de

El-Heyderî hêmanên mîtolojiya yewnanî ji bo derbirînên xwe yê derbarê derbederbûna xwe de bi kar tîne.<sup>5</sup> Karakterekî girîng ê mîtolojiya yewnanî yê ku di helbesta erebî ya nivê sedsala bîstemîn de xuya dike *Sisyphus* e ku ji aliyê helbestvanên wê dewrê ve xerîbiya mişextên komunîst ên ereb destnîşan dike (Moreh, 1976: 256-257). El-Heyderî di helbesta xwe ya “Nameber” de (*Sa’î al-barid*. Al-Haydari, 1993: 213-215, yekem car 1951ê de weşiyaye) *Sisyphus* bi kar tîne da ku dilsariya sirgûnî ya derbarê kêmasiya guherîneke erênî de bîne ziman:

*Bê şek û şiphe, tu xeber tune ku  
Ev dunya ji bo vî belengazî bîne [...]  
Û li darê dinyayê hê jî Sisyphusek heye.  
Û kevîrek (r. 213, 214)*

Li gorî el-Heyderî her temen û her ax xwediye *Sisyphusekî* daîmî ye, yê ku lazim e hetahetayî kevîrekî ta serhevrazê girekî bigindirîne, bes ji bo tilorbûna wê ya pêberjêr temaşe bike. Bêarmancî û bêhêvitiya hebûnê ji aliyê danberheva sirgûniyê komunîst û *Sisyphus* ve hatiye perisandin û nameber tu xeberê ji mişext re nayne; ango rewşa wî yê neguhere û tu xweşxeberên ji welêt wê negihîjin ber destên wî.

Fîgurekî mîtolojîk ê din jî *Oedipus* e di helbestên el-Heyderî de xuya dike. Helbesteke bi sernavê “Oedipus” (*Udîb*. Al-Haydari, 1993: 451-455, yekem car di 1968an de weşiyaye) helbestvan bi trajediya Oedipus re bi vî rengî hemhal dibe:

5 Kêmbê jî ji bo bandora Mezopotamyayê ya li ser helbestên wî binêre: Baram, 1991: 87.

*Wekî şevêkî xalî...*

*Wekî bêdengiyê tenha me ez [...]*

*Ez hatime xapandin [...]*

*Rêwîtiya ber bi singa min çî qas dûr e* (r. 451, 452, 454)

Trajediya Oedipus a ku divê dê û bavê ne-helal biterikîne da ku kehaneta kahîna pêk neyê, ango xwe ji kuştina bavî dûrxistin, di helbestên el-Heyderî de hewcedarî an jî ya rasttir xwestineke mezin heye Iraqê terk bike da ku xwe ji dûmahîka xemgîn a ku li benda ronakbîrê mixalif e, bifilitîne.

### **Dijberiya rejîmê di helbesta el-Heyderî de**

Girtîgeh û şkençe di helbestên el-Heyderî de cihekî girîng digire. Serpêhatiya şkençeyê di pirraniya helbestên wî de bi şayesandinên têvel ve rû dide, herwiha salixê şkencekarê xwe dike yê ku neynokên girtîyan dikişîne, pirçên navrana wan dişewitîne, qamçiyên li wan dide û bi awayekî metaforîk wî di qutiyeke de asê dike. El-Heyderî li xwînerên xwe nayê rehmê, salixdana biêş ya ronakbîrê bêçare bi qefaltinên ku nimînerê rejîmê ve der dike, wekî ku di vê helbestê de jî berdest e “Sirr” (Sirr. Al-Haydari, 1993: 299-302, yekem car di 1965an de weşiyaye):

*Tu yê helboqeyê bişidîni û divê tu min nekuji*

*tu yê sînga min wêran bikî [...]*

*Qamçiyên ji xwe re laş bikin wargêh*

*Wekî jehra mar*

*Wê li bedena min re biçin [...]*

*Tu yê dîsa porê min bişewitîni*

*Û neynokên min bikişîni*

*Lêbelê raza min*

*Wê wekî birrekê bimîne di can û cesedê min de*

*Ji bo zilamekî azad du sembol [...]* (r. 299, 300, 301)

El-Heyderî bi vî rengî serpêhatiya ronakbîrekî komunîst ê mixalif ên ku ji aliyê rejîma Iraqê ve tade lê hatiye kirin digihîne xwîneran. Birreka ku wekî qamçiyên ya di risteyên li jorê de têgihîstinekî dide xwînerî ku tê de ronakbîr mîna heywanekî biçûk e ku ji aliyên desthilatên zalim ve goştê canê wî bi madeyekî xweş tê xwarin. Bi riya vegotinên şkençeyê

yên hunerî ve el-Heyderî di helbesta “Tu ber bi Jêr Hatî” de bi hûrgilî qetlên ku ji aliyê nimînerên rejîmê ve li piştî dîwarên girtîgehê tê kirin, dinitirîne (*Ji'tum ma'a al-fajr*. Al-Haydari, 1993: 313-315, yekem car di 1965an de):

*Tu daketî li jêrê*  
*... Ê va li vir e*  
*Karesateke bêlêborîn pêkhatî*  
*Tu daketî li jêrê*  
*Ê va li vir in em*  
*Kuştiyekî li bêdengiyê [...]*  
*Ê rojê tu car hilneyê êdî*  
*Ê li mala min a*  
*Noqî mirinê bûyî*  
*Gavên zarokên min ên bêdeng (r. 313-315)*

Helbet nayê înkarkirin ku wekî ronakbîrekî mixalîf ji aliyê rejîma Iraqê ve “tade” li nasnameya el-Heyderî hatiye kirin, ew di helbestên xwe de girîngiyeke mezin ji vê bergehê nasnameya xwe re terxan dike. Helbesta bi navê “Bajarê ku ji aliyê Bêdengiyê ve Hatiye Wêrankirin” bi risteyê xwe ve xulasayekî nîşanî mirovî dide ku em tê de dibînin bê ka rejîm xwediyê çi helwestê ye dema ku ronakbîr xwe ji bo civakê dibexşîne. (*Al-madina al-lati ahlakaha al-samt*. Al-Haydari, 1993: 723-728, yekem car di 1990î de weşiyaye):

*Divê tu (ronakbîr) ji navrana qehbekê bêtir nebî tu tiştî.*  
*An jî ji destên bênamûsekî (r. 727-728)*

Bi vî awayî, rejîm ji ronakbîr re rave dike bê ka divê ew çi karî bike an jî divê xwe ji çi karî dûr bixe. Hevberkirina zindanî bi navrana qehbekê an jî destên bênamûsekî, bi gelemperî helwesta ronakbîrên li Iraqê alaz dike û qesta wî sebarek bi helwesta komunîstan e ku di nivê duyem ê sedsala bîstemîn de li wî welatî dijiyan. Her yek an jî hemû ronakbîrên ku diwêrin ji rejîma Iraqê re mixalefetê bikin, wekî ku di helbestê de jî hatiye nitirandin dibe ku encama wan “Dilopek Xwîn” be (*Qatrat dam*. Al-Haydari, 1993: 683-684, yekem car di 1990î de weşiyaye):

*Dibe ku em bimirin... dibe ku em bèn definandin*  
*Dibe ku em bèn dardekirin (r. 683)*

Ev yeka şayesandinên şkenceyê yên ku di helbesta “Sirr” de derbas dibûn, bi bîra me dixey; bi gotineke din, di vê pêwendê de li gorî helbestên El-Heyderî ji salên 1960an heta 1990an tu tişt neguheriyê.

### **Nasnameyên pîrr-alî di helbesta el-Heyderî de**

Ji bo el-Heyderî, serpêhatiyên li sirgûnê ji hemû tiştan bêtir dirûvê xwe daye nasnameya wî, wekî ku di helbesta navborî “Mirina di Çar Dengan de” de jî derbas dibe:

*Bêheysiyeziya sirgûnê çiqas mezin e*  
*Xwe wekî mirov nedîtin çi belengaziyek e*  
*Tenê*  
*Li sirgûnê (r. 822)*

Li gorî el-Heyderî, sirgûn dibe sedem ku mirov zêdetir li nasnameya xwe bihese û zêdetir pirsîyaran di derbarê wê de bike. Lêbelê nasnameya kesekî ne tenê ji aliyê take-serpêhatiyêke ‘eyan ve dirûv digire. Di helbesteke bi navê “Deh Nasname” de (*al-Huwiyyat al-’ashr*. Al-Haydari, 1993: 621-628 yekem car di 1989an de weşiyaye) vegotinê ji çend nasnameyên têvel ên xwe re terxan dike û aloziya rewşa “dabeşbûna” di navbera ewqas dabestîbûnan de wiha rave dike:

*...Û ez îşev derketim derve*  
*Di bêrika min de deh nasnameyan destûr da min*  
*Da ku ez derkevîm derve*  
*Navê min... Bulend bîn Ekrem*  
*Ji malbateke gellekî naskirî me*  
*Qesem be ku min tu kes nekuştîye*  
*Min dizîya kesî nekiriye*  
*Û ez ê ji tu kesî tişteki nedizim*  
*Û deh nasnameyên di bêrika min de şahidiya min dikin*  
*Ji ber vê yekê îşev çima nikarîbin derkevîm derve? (r. 621)*

Di vê helbestê de wisa dixuye ku vebêjerê helbestê aidê tu nasname an jî komeke etnîk nîne. Berevajî vê yekê, li ser aidiyeta wî guman heye.

Vebêjer hemû tiştên ku kiriye dinitirîne da ku aidê derekî be, lêbelê bi ser nakeve. Ew sirgûniya xwe wekî riya bexteweriyê dibîne lêbelê ev yeka tu carî nabe rastî. Helbest bi nîşeyeke erênî ve dest pê dike, dema ku merivek danê şevê bi deh nasnameyên xwe yên di bêrikê de, ji bo gerekî derdikeve derve. Ew deh nasname, misilmanbûn, komunîstbûn, Iraqîbûn, laîkbûn, sunnîbûn, hwd., ne tu tiştên fedîkirinê ne, lê vebêjer bi wan serbilind e, çimkî ew şahidiyê jê re dikin ku tu tiştêkî xerab nekiriye û zerara wî negihîştîye tu kesî. Di berdewamiya helbestê de, şibandineke bi sirgûna berdewam ve, xwîner dikeve wê ferqê ku tarîfî (*zilûmat*) û kolanên xalî yên ku tenê dengê gavên helbestvan lê tê bihîstin (*rasîf al-sharî' kan khilwan illa min sawt hidha'î*). Sîbera wî mêrikî ji bo bîskekî li hev tê civîn û bîskekî din bela-wela dibe yanî ew heye. Li gorî raya wî Iraq xwediyê nasnameyeke aşkera nîne û ew bi xwe jî serê xwe zêdetir xwediyê nasnameyan e. Vebêjer ji bo hebûna nasnameyan misoger bike li berîka xwe teselî dike, dibîne ku hê jî li dewsa xwe ne û dipeyitîne ku ew bi xwe hê jî ew kes e ku berê xwe wisa didît.

*Ev navê min e*

*Ev wesfê min e*

*Ev înzaya serkarê polîsên bajarê min e [...]*

*Û heft nasnameyên din bi min re ne (r. 624)*

Wekî ku tê dîtin, vebêjerê helbestê xwediyê pîrr nasnameyan e, lêbelê li gorî hestên wî qet yek jî aidê wî nîne. Ew ji bo ku piştrast be li ser hevdu çend caran kontrol dike bê ka ew hê jî xwediyê wan nasnameyan e, çiqas zêde nasnameyan dibîne ewqas kêma aidiyetek ligel wan hîs dike. Dema ku du polîs tên li ber derê wî û jê dipirsin ku ew kî ye, paradoks mezin dibe. Wexta ku polîs navê wî ango Bulend bîn-Ekrem bi lêv dike û ew jî deh nasnameyên xwe nîşanî polîsan dide, polîs li wî û li nasnameyên wî dikenin û jê re dibêjin ku ew sîcdar e. Bi vî awayî, piştî deh nasnameyên xwe aşkera dike, dîsa jî polîs jê re mîameleya biyaniyekî dikin û wî tawanbar dikin. Ew nasnameyên cihêreng ku tu mişkîleyên wî bi wan re tune bû, çî misilmanî, Iraqî, sunnî, laîk, komunîst, bêrûdî, londonî yan jî yên mayîn. Encama wî jî wiha didome.

*Ez têgihîştim ku nasnameyên min belgeyên xelet in*

*Û ez ê îşev li ser navê deh nasnameyên xwe li hepsê razêm [...]*

*Wextekî... li welatekî bênasname*

*Kesê ku xwediyê nasnameyekî ye tê tawanbarkirin. (r. 627)*

Hetta di girtîgehê de jî zindanî gazî gardiyan dike ku were nasnameyên wî biqelişîne û pirtî-pirtî bike, çimkî ew êdî xwediye tu qîmetê nînin.

*Wan biqelişîne... Wan biqelişîne, ey gardiyanê min  
Wan pirtî-pirtî bike... Wan pirtî-pirtî bike, ey gardiyanê min (r. 627)*

Ev deh nasname dewsa ku hinekî îtimadê bide dijberê rejîmê yên Iraqî û jê re bibe cihê referansê, ji wî re astengî derdixe. Nimînerên hiqûqê (polîs, zindanvan) heqaretê li nasnameya wî dikin û nasname êdî kêrî wî nayên. Polîsên ku divê sivîlan biparêzin, qerfê xwe pê dikin û tenê siya polîsekî di dawiya helbestê de xuya dike, bi gotineke din tenê polîs diwêrin li kuçeyan bigerin; berevajî destpêka helbestê ku li wir bi dengê lingên xwe ve, ji vebêjerê helbestê û pê ve kes tune bû, di dawiyê de xêncî polîsan tu kes xuya nake:

*Xêncî siya polîsan siya tu kesî li welatê min tune ye (r. 627)*

Bi temamî wekî rewşa ku ew bi salan li Iraqê rûbirû maye, dubendiya di navbera nasnameyên wî de ji ber vê yekê di dawiyê de dibe sebeb ku ew bênasname bikeve hepsê. Nasnameyên wî yên ji hev cuda ku li ber çavên wî wekî nasnameyêke aloz û guherbar -Iraqîbûn, misilmanbûn, laîkbûn, hwd.,- diguhere, bi temamî ji aliyê rejîmê ve tê paqijkirin. Dawiya dawî, ev pêkhatyên têvel ên nasnameya helbestvan -misilmanbûn, mesîhîbûn, Iraqîbûn, ronakbîrê tepeserkirîyê lêgerîna riya xwe de- berî û piştî komkujiya *Helebçeyê* bi salan li pey hevdu di helbestên el-Heyderî de xuya dikin. Lêbelê beriya *Helebçeyê* hema hema bi tu qaîdeyê îşareta kurdbûna el-Heyderî an jî fikra kurd û Kurdistanê di helbestên wî de nayên peyda kirin. Digel vê yekê, piştî *Helebçeyê* el-Heyderî ewqas zêde bi kurdan re hemhal dibe ku vegotîneke helbestî ji vê babetê re terxan dike, tiştêkî ku wî berê hîç nekiribû.

### **Piştî *Helebçeyê* nasnameya kurd di helbestên el-Heyderî de**

El-Heyderî di helbesta “Da ku Em ji Bîr Nekin” de (*Li-kay la nansa*. Al-Haydari, 1993: 769-773) wê dema tirsnak ku balafir êrişê dibin li ser *Helebçeyê* dicemidîne û xwe bi kurdan re dike yek. Di helbestê de el-Heyderî, şîna miriyan dike û êrişê dibe li ser Sedam Huseyn. Divê em vê jî tomar bikin ku heta wexta ku hê li Iraqê bû, el-Heyderî li Bexdayê dijiya ne ku li Kurdistanê; dema ku derbarê *Helebçeyê* de dinivîse ew xwe



zaf nêzîkî kurdan dike, wekî ku bi xwe bîra çiyayên Kurdistanê kiribe, wekî kurdekî ku li wir jiyabe. Di destpêka helbestê de, ew bajarê beriya komkujiyê dinitirîne, baxçe, xanî, xeyalê nêrgiz û gulan salix dide, heta ku ji nişkê ve di rojêke sayî de ya berevajî bêhna kulîlkan, hewa bi tiştêkî din ve mişt bû:

*Bayekî bijehr belav dibe*

*Ji çavên Boomayekî tê pîfikirin*

*Da ku bijehrînin hemû zarokan, mala min... welatê min (r. 772)*

*Booma ango Bûm* kund e û bi gelemperî xwediyê wateya xeberên nebixêr e<sup>6</sup>, îhtimal e ku li vir balafiran dinimîne ku gaza kujende dirindandin. Di vê helbestê de, hemhalbûna bi kurdan re ya el-Heyderî bi temamî tê dîtin, çimkî ew Kurdistanê wekî cihê jidayîkbûna xwe dinitirîne, nitirandina guherînan ve zêdetir balê dikişîne li ser êrişa kîmyewî:

*Riya ku diçe mala min dora goristaneke bi du hezar kesî ve pêçayî ye li Kurdistanê*

*Xêncî mirin û siya wê tu tişt tune*

*Xeyala mezinkirina nêrgizekî li baxçeyekî de nîne*

*Fîlhtiyan [balafîrên Iraqî] tu tişt nehiştin*

*Xêncî miriyan û xweliya wan a ku tev li dûyê reş bûye (r. 772)*

Şayesandina hemû rûxandin û cankêşiya her meriv, heywan û kulîlkekî, wexta ku du hezar baxçe dibin du hezar goristan, bi gotineke rast heqîqet e û bi şahidiya Abbas Abd al-Razzaq Akbar ve jî li hev tê, çimkî wî bi pêşmergeyan re hevrêti kiribû û paşê bûyerên ku li *Helebçeyê* pêk hatibûn kişandibû filmê. Li gorî gotina wî: “Gazê hemû jiyana xwezayî, heywan û balinde kuştibûn. Min bi hezaran bizin û mih dîtin, giş telef bibûn. Herwiha gur jî [...] Min li ser riya derdora *Helebçeyê*, bi hezaran heywanên kuştî kişande filmê. Min nikaribû tiştêk bibihîsta. Çûk tûne bûn. Bêguman çu deng û his tune bû [...] bêdengiyê ez dîn dikirim.” (Hiltermann, 2007: 105).

6 Ji ber vê yekê peyva erebî (ya ku di kurdî de jî berdest e) ji wergera wê ya motamot zêdetir li pêwendê tê.

Li vir el-Heyderî bi çend risteyan ve digihîje lûtkeya helbestê ku hin kes dikarin wekî hêvîdarî bibînin lê dibe ku hin kes jî wekî pêşbîniyê şirove bikin:

*Xwîna kuştîyan wê li dû rûyê şeytên bikeve  
Ji vê neynîkê heta neynîkeke din  
Ji ya herî dûr heta ebediyetê  
Û werîsê rojekî li dora stûyê kujer biale (r. 772-773)*

Eger mirov ji bergehê nûjen ve li dawîya helbestê binêre, 18 sal piştî *Helebçeyê*, dema ku Sedam di sala 2006an de hat dardekirin, tê dîtîn ku pêşbîniya El-Heyderî bi temamî rast derketiye.

Di heman dîwana helbestan de el-Heyderî helbestek bi navê “De ka ez vegerim...li kê...?” diweşîne (*A’a’udu... li-man...?*) (Al-Haydari, 1993: 793-797), ku tê de bi taybetî behsa *Helebçeyê* nake, lêbelê şayesandinên rûxandinê û dîroka çapa wê bi temamî nebe jî gumanê li ser têkiliya wê ya bi bajarê kurdan re ji holê radike:

*De ka ez li kê vegerim...!? Li mala xwe...!?  
Li biçûktiya xwe ya mirî...!?  
Li qûça kevirên ku rûxiyane  
Ya ku dike bêdeng rondikan bibarîne...!?  
[...] De ka ez vegerim ji bo ku li xwişka xwe bigerim  
Ji bo mala xwe  
Di nav qûça keviran de...!? (r. 795, 796)*

Dayîkeke belengaz a ku du caran navê wê di helbestê de dibore û laşên zarokên biçûk, intibayeke wisa li ser mirov çêdike ku el-Heyderî behsa *Helebçeyê* dike. Di helbesteke din de, “Xwendîneke Wêneyên Kevn” (*Qira’a jadida li-suwar qadima*. Al-Haydari, 1993: 655-659, yekem car di 1989an de weşiyaye) el-Heyderî qerfê xwe bi xeberên weşiyayî û rojnameyên li Rojava dike, qaşo li wî zemanî ku li Kurdistanê laşê zarokên biçûk hê jî bêxwedî li erdê ne, ew ji bo dunya û aşitiyê piştgirîya tiştên baş dîkin. Xwîna sor a li ser rojnameyan qurbanîyên bêguneh dînimînin û berevajî gotinên pelepûç ên Qesra Spî ye ku li gorî el-Heyderî mexseda wan ew e ku çavên dunyayê ji babeta *Helebçeyê* re bigirin.

Lêbelê, herçiqas el-Heyderî behsa Kurdistan û rûxandina *Helebçeyê* kiribe jî, dema ku kesek li berhevoka helbestên wî yê dawî bikole, wê

xuya bike ku digel *Helebce* û *Enfalê* el-Heyderî hê jî bi êş û evîneke mezin ve behsa Bexda û Iraqê dike. Wekî kurdekî erebbûyî ew hê jî xwe mîna ereb û Iraqiyekî dibîne û hê jî bêriya paytexta Iraqê dike û derheqê êşa wê de dinivîse: “Û ew dibêjin ku ronîya çavên mirovên di bajarê min de temiriye.” xemgînî û bêçaretîya bajêr dişayesîne di helbesta bi navê “Eger Ew Sibe Biteq” (*Ghadan idha ma infaqarat*. Al-Haydari, 1993: 775 - 778 [r. 776]).

Di helbesteke din de, “Lêborîn” (*I’tidhar*. Al-Haydari, 1993: 779 - 782), ew dinivîse “Û tu behr, tu morî... tu girav tune ye li Bexdayê [...] di dereweke pîrr mezin de ku navê wê Bexda ye” (r. 779, 782) xeyala Bexdaya dewlemend a qedîm û xalîtî û xizaniya bajarê modern dinitirîne. Di helbesta bi navê “Ji Piştî Deriyên Girtî” de (*Min wara’a al-bab al-musada*. Al-Haydari, 1993: 799-800) helbestvan welatê xwe tawanbar dike ku hem bûye qatil û hem jî bûye qurbanî: “Ey welatê min... ey ê qatil... ey ê qurbanî” (r. 800). Bêrîkirinajiyana li Bexdayê ya El-Heyderî, wekî ku çend helbestên wî yên din de jî berdest e<sup>7</sup>, herwiha ji helbesta wî ya piştî *Helebçeyê* jî diyar dibe ku ji bêrîkirina wî ya Kurdistanê zaf zêdetir e.

## Encam

Divê mirov ji bo lêgerîna perçeyek ji paşxaneya helbestvanî bala xwe bide bandorên cihêreng ên ku helbesta el-Heyderî aşkera dike. Iraqa salên 1950yî, bi taybetî jî Bexda cihê pir-rengiya etnîsîte, dîn, mezheb û tevgerên politîk bû; ev paşxane bû ku el-Heyderî li hember wê têdikoşiya. Ew ji malbateke dewlemend bû, lê ji dewlemend û feqîran heval û hogirên wî hebûn û herçiqas ji aliyê aboriyê ve dikaribû di saziyên bijare de bixwîne jî wisa nekir, wî xwe bi xwe perwerde kir. Di rastiya xwe de, binemala el-Heyderî kurd e, lê ji ber ku li Bexdayê mezin bûye ya ku demeke ronakbîrî û werareke çandî de ji Qahîre û Bêrûdê kêmîtir nebû, wî xwe ji kurdekî zêdetir wekî erebekî didît û ji ber vê yekê jî xwediyê nasnameyeke wekî “kurdekî erebbûyî” bû, yê ku xwe di nava muhîta erebî ya navborî de didît. Ji ber vê yekê herçiqas bi awayekî teorîk ji

7 Herwiha van helbestan jî bibîne: “Di Navbera Du ‘Elametan de” (*Bayna ‘alamatayn*. Al-Haydari, 1993: 807-810) ya ku yekem peyva wê “Bexda” ye ku tê de xeberdaneke guherbar heye; “Wesyetname” (*al-Wasiyya*. Al-Haydari, 1993: 825 - 826) ya ku tê de vebêjerê helbestê derbarê erdê xwe û dahatûyê de xeber dide; ji xwe helbesta bi navê “Û eger Iraq ji kuliyan re bibe şahî” (*Fa-idha al-Iraq walima li-jaradiha*. Al-Haydari, 1993: 831 - 835), bi sernavê xwe ve hesreta jiyana berê ya helbestvan li welatê wî destnîşan dike.

binemaleke tevlihev ango kurd û ereb hatibe jî, jiyaneke bi tevî ereban li paytexta ereban derbas kir, bi vî awayî salên wî yên girîng li wir teşe girt û bi kûrî beşdarî jiyana çandî ya Bexdayê bû ku vê yekê ji kurdbûna wî zêdetir karîgerî li ser jiyana wî kir. Ji xêncî vê, wekî misilmanekî ku mesîhî û mirovên ji dînen din jî nas dikir, ew zêdetir bi bandorên komûnîzm, zilma polîtîk û sirgûnê re rûbirû dima, nasnameya el-Heyderî wekî ku tê texmînkirin nasnameyeke melez û guherbar bû. Hemû pêkhatayên nasnameya wî wekî ku di vê nivîsarê de jî tê kolandin, wexta ku bi awayekî cihê an jî bi hev re bê fikirîn dibe ku dunyaya wî ya hindirîn aşkera bike.

Mirov dikare du encaman ji vê xebatê derxe. Ya ewil wekî ku jê tê payîn, nasnameya el-Heyderî di helbestên wî de di navbera pêkhatayên têvel de hatiye dabeşkirin. Têkiliyên nasnameya wî etnîsîteyên din, mî-rasa misilmanan, sembolîzmên mesîhiyan û mîtolojiya yewnanan re hebû ku ji serpêhatiyên dîni bêtir wekî rewşeke derûnî vedigot û di nivê sedsala bîstemîn de rewşa entelektûelên komunîst ên Iraqî nîşan dida ku hatibûn tepeserkirin û ji welêt hatibûn derbederkirin. Di helbestên wî de em dikarin nasnameyeke pîrr-alî û guherbar bibînin ku ji xwe re li riyekê digere, dema ku salixa têkiliyên xwe yên bi rejîma Iraqê û riyên têkoşinê dibîne ev lêgerîna wî tê dîtin.

Ya duyem, ji lêkolîna li ser helbestên helbestvanên kurd ên din ku ji nifşa el-Heyderî ne, me dît ku wan her gav behsa kurdbûna xwe kiriyê û ji ber vê jî em pêşbînî nakin ku helwesta wan a derheqê *Helebçeyê* de cuda be. Lêbelê el-Heyderî “kurdekî erebbûyî” bû û lewma herçiqas gellek helbestên xwe îthafê Komkujiya Helebçeyê kiribe jî, di berhevoka helbestên xwe yên dawî de bi nostaljiyeke gurr ve wekî mala xwe derbarê Bexda û Iraqê de dinivîse. Wisa xuya dike ku ji 1940î heta 1960î wekî beşdarekî jiyana çandî ya Bexdayê û komên hunerî yê bajêr, wextê ku hê terîqetparêzî wekî îro aşkera nebû, el-Heyderî di helbestên xwe de zêde bala xwe neda pêkhatayên nasnameya xwe ya kurdî, herçiqas mirov pêşbînî dike ku hinek guhertinên derbarê kurdbûna wî de çêbe jî, ev pûtepênedan bi aşkerayî di helbestên wî yên piştî *Helebçeyê* de jî karîger e.

Di rastiya xwe de, piştî komkujiya Helebçeyê, ew wekî cihê jidayîkbûnê behsa Kurdistanê dike û hesreta Kurdistanê tîne zimên mîna ku xwe li wir perwerde kiribe, lêbelê ew riste jî îhtimal e ku tenê hestên wî yên li hember zilmê bin, çimkî ew hê jî ji nasnameya xwe ya kurdî zêdetir balê dikişîne li ser nasnameya xwe ya Iraqî û erebî. Lewma em

dikarin bibêjin ku digel bûyera *Helebçeyê*, el-Heyderî dilsoziya xwe ya Bexda û Iraqê berdewam kiriye û di derbarê wan de nivîsiye û herçiqas *Helebçe* li ser gellek helbestên wî karîger be jî, ev karîgerî wekî Iraqîbûn û rabirdûya erebî karîgerî li ser nasnameya wî nekiriye.

Lêgerîna heta nika ya cihana hindirîn a helbestvan dibe ku valahiyeke heyî dagire û herwiha dikare derbarê jiyana sirgûniyên Iraqî de yê di nivê duyem ê sed sala bîstemîn de zêdetir agahiyan di pêwendiyê berfireftir a rewşa çandî û polîtîk a Iraqa wê demê de berpêş bike. Bi bergeheke taybet ve, ev dikare radeya “erebkirin” a “kurdên erebbûyî” nîşanî me bide, çimkî digel Komkujiya *Helebçeyê* ya ku bi her aliyê ve bûyereke trawmatîk e, el Heyderî dîsa jî bi Iraqê re girêdayî dimîne û bi nasnameya erebî û Iraqî ve jî vebestî ye.

## Çavkanî

Ajami, F. (1998). *The Dream Palace of the Arabs: A Generation's Odyssey*. New York: Pan-theon Books.

Aziz, M. (2011). *The Kurds of Iraq: Ethnonationalism and National Identity in Iraqi Kurdistan*. London and New York: I.B. Tauris.

Al-Azzawi, F. (1997). *The Living Spirit: The Generation of the 1960s in Iraq*. Beirut: Al-Mada (bi erebî).

Baram, A. (1991). *Culture, History and Ideology in the Formation of Ba'hist Iraq 1968-89*. Houndmills: Macmillan.

Bashkin, O. (2009). *The Other Iraq*. Stanford: Stanford University Press.

Basri, M. (1992). *Life's Journey from the Banks of the Tigris to the Valley of the Thames*. Jeru-salem: Association for Jewish Academics from Iraq (bi erebî).

Bengio, O. (1989). *The Kurdish Revolution in Iraq*. Tel Aviv: Ha-kibutz ha-meuhad (bi îbranî).

Bengio, O. (1996). *Saddam's Iraq: Political Discourse and the Language of Power*. Tel Aviv: Ha-kibutz ha-meuhad (bi îbranî).

Bengio, O. (1999). Nation Building in Multiethnic Societies: the Case of Iraq. In O. Bengio and G. Ben-Dor (eds.) *Minorities and the State in the Arab World* (149-169). Boulder: Lynne Rienner Publishers.

Bengio, O. (2012). *The Kurds of Iraq: Building a State within a State*. Boulder: Lynne Rienner.

Boullata, I. J. (2010). Al-Haydari, Buland. In J. S. Meisami and Paul Starkey (eds.) *Encyclopedia of Arabic Literature* (278). New York: Routledge.

Caiani, F. and Cobham, C. (2013). *The Iraqi Novel*. Edinburgh: Edinburgh University Press.

Campbell, R. B. (1996). *Contemporary Arab Writers: Biographies and Autobiographies*. Bei-rut: Al-Sharika al-muttahida li-l-tawzi' (bi erebî).

Farouk-Sluglett, M. and Sluglett, P. (2001). *Iraq since 1958 from Revolution to Dictatorship*. London and New York: I.B. Tauris.

Fattal, S. (2003). *In the Alleys of Baghdad*. Jerusalem: Karmel (bi îbranî).

- Fawzi, A. (1985). *The Most Prominent Press Trials in Iraq*. Baghdad: Matba'at al-intisar (bi erebî).
- Al-Hajj, A. (3991). *Memories of the Palm Tree*. Beirut: Al-mu'assasa al-'arabiy-ya li-l-dirasat wa-l-nashr (bi erebî).
- Hardi, C. (2011). *Gendered Experiences of Genocide: Anfal Survivors in Kurdistan-Iraq*. Farn-ham: Ashgate.
- Al-Haydari, B. (1993?). *The Complete Works*. Kuwait: Dar su'ad al-sabah (bi erebî).
- Hiltermann, J. R. (2007). *A Poisonous Affair: America, Iraq, and the Gassing of Halabja*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Huri, Y. (2006). *The Poetry of Sa'di Yusuf between Homeland and Exile*. Brighton: Sussex Academic Press.
- Jabra, I. J. (1994). *Amirat Street*. Beirut: Dar al-Adab (bi erebî).
- Moreh, S. (1976). *Modern Arabic Poetry 1800 – 1970*. Leiden: Brill.
- Moscatti, S. Abu 'l-'Abbās al-Saffāh. *Encyclopaedia of Islam, Second Edition*. Retrieved from [http://referenceworks.brillonline.com/entries/encyclopaedia-of-islam-2/abu-l-abbas-al-saffah-SIM\\_0150](http://referenceworks.brillonline.com/entries/encyclopaedia-of-islam-2/abu-l-abbas-al-saffah-SIM_0150) (last accessed 23 March, 2014).
- Motzki, H. Sa'īd b. D j ubayr. *Encyclopaedia of Islam, Second Edition*. Retrieved from [http://referenceworks.brillonline.com/entries/encyclopaedia-of-islam-2/said-b-djubayr-SIM\\_8877](http://referenceworks.brillonline.com/entries/encyclopaedia-of-islam-2/said-b-djubayr-SIM_8877) (last accessed 23 March, 2014).
- Al-Musawi, M. J. (1985). Narrative Fiction and Trends of Criticism. In M. J. al-Musawi (ed.). *The Culture of Iraq*, vol. 13 (319 – 344). Baghdad: Dar al-Hurriyya li-tiba'a. (bi erebî)
- Al-Musawi, M. J. (2006). *Reading Iraq: Culture and Power in Conflict*. London: I.B. Tauris.
- Natali, D. (2005). *The Kurds and the State: Evolving National Identity in Iraq, Turkey And Iran*. New York: Syracuse University Press.
- Peled-Shapira, H. (2012). From Imperial Capital to Dungeon: the Construction of the Image of the City in the Works of the Kurdish-Iraqi Poet Buland al-Haydari. *Oriente Moderno*, 92(1), 65-78.
- Peled-Shapira, H. (2013). Days like Nights Indeed? On Time Perception in the Works of the Kurdish-Iraqi Poet Buland al-Haydari. *Die Welt des Islams*, 53(1), 76-107.
- Al-Sa'idi, A. J. (1996). *Memory and Nostalgia*. London: Al-Rafid (bi erebî).
- Shohat, M. (1989). *The Kurds: A Minority at an Impasse*. Beit-Berl: The Jewish-Arab In-stitute (bi ibrani).
- Shulayba, Z. (1996). *Gha'ib Tu'mah Farman: A Comparative Study on the Iraqi Novel*. Bei-rut, Lebanon: Dar al-kunuz al-adabiyya (bi erebî).
- Smith, A. D. (1995). The Formation of National Identity. In H. Harris (ed.). *Identity* (129 - 153). Oxford: Clarendon Press.
- Tripp, C. (2000). *A History of Iraq*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Weissbort, D. and Simawe, S. A. (2003). *Iraqi Poetry Today*. London: King's College London.
- Zeidel, R. (2011). The Iraqi Novel and the Kurds. *Review of Middle East Studies*, 45(1), 19-34.